R:3

**Deqê axavtina rêzdar Hesen Şerefî li ....**



R:4

**Nirxên Azadiyê**





R:6

**Rojavayê Kurdistanê derfetek din yan...**



R:11

**Destberdana ji xwendinê li ...**



Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 195
5'ê Çileya Pêşîn a 2012'an
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

**Hêdî hêdî em nêzî rojek herî pîroz di jiyana Kurdan,wate 26'ê Sermawezê dibin, ew roja ku hêma û mînak e ji bo rêzgirtina xebata pêşmergên cangorî ên gelê Kurd. Lewra hewce ye her Kurdek li her cihekî ku lê dijî, erkê xwe bi awayê herî baş di vê rojê de bi cih bîne û ked û tekoşîna wan bilind ragire.**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

# Nûnerê PDKÎ bû endamê Konseya serokatiya UNPO'ê





## Hêyetek PDKÎ beşdarî di kongireya UNPO'ê de kir

Heyeteke PDK Îranê, bi serperestiya Luqman Ehmedî berpirsê pêywendiyên derve, li 11'emîn kongireya UNPO li bajarê Jinivê de bûn. Di roja yekem a kongirê de berpirsên heyetên beşdar raportek li ser rewşa siyasî û mafê mirov di welatên xwe de pêşkeş kirin. Her di vê peywendiyê de, Birêz Ebdulla Hicab nûnerê PDKÎ di UNPOyê de, raporek li ser rewşa Kurdistanê pêşkêşî kongirê kir.

Di roja duyemîn a karê kongirê de, gelale û pêşniyarên beşdaran ketin ber bas û pştî wê gelala PDKÎ li ser rewşa mafê mirov di Îranê de, bi dengê giştî hat pejirandin. Kongirê di doma karê xwe de sekreter, serok û desteya serokatiya nû hilbijartin û herweha Ebdula Hicab berbijêrê PDKÎ bi dengê giştî, weke endamê serokatiya UNPO'ê hat hilbijartin.

### Komîteyek navnetewî bo çareserkirina pirsa Kurd pêk hat

Li ser daxwaza "Dêzmond Toto" xwediyê xelata sulh a cîhanî û yêk ji rêberên tevgera Apartaydê li Efrîqiya Başûr, komîteya navnetewî bo çareseriya pirsa Kurd li Turkiyê û destpêkirina gotûbêjan pêk hat. Komîteye bi navê Komîteya Navnetewî a Aşîtiyê li Bajarê Birûksêl bi awayek fermî hebûna xwe ragehand. Dom R: 2



## Sergotar

### Kurd! Xebata medenî yan tundûtîjî

**Ew pirsyara ku li wan salên dawiyê de li gotara siyasî a Kurdistanê de berdewam tê ber bas**

Beşek li ser vê bawerê ne ku xebata çekdariya Kurdan li tewaya beşên Kurdistanê de divêt wek tewera xebata mafxwazane a vî gelî berçav bê girtin û bê peyrew kirin.

Ji aliyek din ve jî hijmarek li ser vê bawerê ne ku divêt gelê Kurd dest ji xebata çekdarî û tundûtîjiyê hilgire û bike xebata medenî. Her yek ji alîgirên wan boçûnan jî hokarên curbicur bona durustiya boçûnên xwe hene, ku li wir de em naxwazin herne ser wan sedeman.

Lê li gorî ezmûnan hukmeke giştî li ser her yek ji wan boçûnan û retkirina ê din, me di gel encamek şaş ber bi rû dike, jiber ku Kurdistan hatiye parve kirin û her beşek jî li jêr dehilata hikumetekê de ye ku aliyê kêm her ji niha de li gorî dîtingeha wan derheq çareseriya kêşeyas Kurd bi giştî û li beşa li jêr dehilata xwe de bitaybetî, her weha siyaseta wan ya navnetewî cudahiyek berçav tê xuyakirin, lewra Kurdên her beşekê a baş ew e ku bi hûrbînî û xwendina xwe ji siyaset û bernamên hikumetên deshilatdar bi ser xwe de şêweya xebata guncaw diyarî bikin, şêwe xebatek ku heya bikarin bi nirxek kjêmtir deskewtek zêdetir berhem bîne.

Heya dawiya sedsala bîstemîn, siyaseta wan hikumetan li tewaya beşan de siyaseta helandin, nehêştina dîrok û tepeseriya xebata netewî a ...

**Dom R:3**

Doma sergotarê, R:1

bûye û tu derfetek bi vê neteweyê û heta azadîxwazên welatê wan nedane, ta bikevne pey mafên herî destpêkî ên xwe. Lewra Kurdan ji du riyan zêdetir li ber dest de nînin:

Hewarbirina ber çekê û tehemula nirxê vê xebatê herçend gellek giran jî be, yan serîtewandina bo hikumetên dîktator û desta kêşana ji pênaseya netewî, bi dîrok, kultur, ziman û deb û resmêt wan. Lê Kurd neketiye qedeman û riya yekem hilbijartiye, bona vê ku her wek Kurd bimîne.

Lê li vê serdemê de guhertinên bilez û kûr bi ser cîhan de, û bi ser sîstema deshilatdariya hikumetên zal bi ser Kuyrdistanê de jî hatiye, niha beşek ji Kurdistan ku li jêr deshilata hikumeta Îraqê de bû, bi beşek berçav ji mafên xwe ên siyasî û netewî şa bûye. Kurdên Sûriyê çavnihêrê rûxana hikumeta Be's a wî welatî ne, û heke yekîtiya refên xwer biparêzin, dikarin bi rûxana hikumetê aliyê kêm bigîjne beşek ji xwastek û daxwaziyên xwe.

Guhertinên Turkiyê li gellek waran de, cudahiyek zêde li gel, guhertinên wan du welatan de heye, ji ber ku li Turkiyê de guhertiek bingehîn, bi sewr boçûnên civaka vî welatî de hatiye û ber bi pêşveçûn û vekirina feza de ne, li encam de siyaseta hikumetê jî li her astekê de, bitaybetî li astê herêmî û navnetewî de guhertin bi ser de hatiye ku



Jinên Kurd li bakûrê Kurdistanê di dema piştevaniya ji gireva girtiyên Kurd

bûye sedema pêkhatina rewşak baş bo xebata medenî bo Kurdên akinciyê vê bveşê ku dikarin mifahek baş jê wergirin, û daxwazên xwe ji vê riyê ve pêngav bi pêngav dabîb bikin.

Ezmûna xebata wan salên dawî li vî welatî bi taybetî ezmûna mehên borî bi taybetî li wan salên dawî de cihê jê hînbûnê ye. Her wek em hemû dizanin ku li wan salên dawî de bi sedan girtiyên Kurd bo heyamê 68 roj, ketin gireva birçîbûnê, wan bona şikandina gireva xwe sê daxwaz ji hikumetê kirin:

Mafê bergirîkirina ji xwe li dadgehan de bi zimanê Kurdî, xwendina li xwendegehan de bi zimanê Kurd û azadbûna birêz Ebdulla Ocelan li girtîgehê de. Bi sedan hezar kes ji xelkê Kurd û ronakbîr û demokratên Turk li Turkiyê û beşên din ên Kurdistanê de û heta li Ewqropa piştevaniya ji daxwazên girevgirtiyan kir û bona nîşandana piştevaniya xwe rijiyane ser kolanan.

Encama wan berxwedanên medenî bû sedema derketina biryarekê ku bergirîkirina girtiyên Kurd li dadgehên wî welatî de bi zimanê Kurdî bê azadkirin û xwendina bi zimanê Kurdî li xwendegehan de ji riya destûrî ve amadekarî jêre bê kirin.

Herçenbd ku li wan berêkaniyên medenî de tewaya daxwazên girevgirtiyên Kurd serî negirtin, lê ya ku bi dest hat, deskewtekî baş bû. Bi taybetî ku ew xebata medenî bû sedema vê ku carek din raya giştî û netewî dengê rewa ê mafxwaziya Kurd li vê beşê ji Kurdistanê bibîse û piştevaniyê jê bike, lewra guman têde nine ku ew xebata medenî, xebatek serketî bû, û cihê dilxweşiya her Kurdekî ye, û cihê xwe de ye ku bi vê sedemê pîrozbahiyê ji gelê Kurd bi giştî û ji Kurdên Turkiyê û girtiyên siyasî ên vê girevgirtinê bikim.

Her li vir de hewce ye ku qala du mijarên pêwendîdar bi serkevtina vê xebata medenî bikin ku bê wan, ew deskewt bi destve nedihatin:

1_Rêxistina rêkûpêk ya vê xebatê li navxwe a girtîgehan û li ser şeqamên Kurdistana Turkiyê û îradeya bihêz a girtiyan li warê dirêjîdana bi gireva xwe bi bê tu guman û dudiliyekê û daxwaza birêz Ocelan bi dawîanîna girevê.

2_nîşandana nermiya ji aliyê hikumeta Turkiyê ve derheq qebûlkirina beşek ji daxwaziyên girevgirtiyan ku rê xweş kir bona dawîanîna girevê, berî vê ku kêşe kûrtir bibe, û bibe sedema dana nirxek zêdetir.

Piştî bi encambûna vê xebatê û gellek xebatên din ên siyasî ku Kurd li Turkiyê li dema hikumeta nû ya wî welatî de ceribandine, pêkhatina rewşa siyasî a Turkiyê, bo xebata siyasî li parlementoyê, şaredariyan û civaka vî welatî bi giştî, gelo dema vê nehatiye ku hêzên siyasî û neteweya Kurd bi giştî bi nirxandina qazanc û zirarên her du xebatên çekdarî û medenî li pêxema berjewendiya netewî de carek din nirxandinê bikin, û riya ku deskewtên zêdetir û nirxa kêmtir hebe, hilbijêrin.

Ceribandinên dîrokî ên xebata netewî a gelê Kurd, nasîna taybetmendiyên serdem û berjewendiyên netewî me tînin ser vê bawerê ku li her cihekî de ku rewş bo xebata medenî pêk bê, dest birin bo çekê şaşiyek mezin e, û hewce ye ku Kurd desta jê hilgire.

## Jîrar Şaliyan, serdana Binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ kir



**Li gor nûçeyan roja 30'ê Xezelwera 1391'an, Jîrar Şaliyan kesatiyê siyasî ê Ewrûpayî û lêkolerê erdnîgariya siyasî û dostê kevnar ê gelê Kurd û PDKÎ, seredana deftera siyasî kir û ji aliyê heyetek partiyê bi serperestiya birêz Mihemmed Nezîf Qadirî ve, pêşwazî jê hate kirin.**

Birêz Şaliyan armanca seredana xwe vegerande ser lêkolîn û nirxandina rewşa siyasî a herêmê û hinek karên din.

Navbirî di vê hevdîtinê de, hinek pirsyar li ser rewşa siyasî a Îran û Kurdistanê bi giştî, û bi taybetî Kurdistana Rojhelat, rewşa opozisyona Îranê, nêrîna PDKÎ li dor pirsa Sûriyê û helwêsta Turkiyê û Siûdiyê di vê peywendiyê de xistin ber bas, ku ji aliyê birêz Mihemed Nezîf Qadirî ve bersiva wan pirsyaran hat dan.

Doma nûçeya " ragehandina komîteyek navnetewî...

Di konfransek çapemenî de Ana Lorîn seroka giştî ya komîteya aştiyê, weke yekem kes gotinên xwe pêşkêş kirin û ragehand ku armanca komîtê destpêkirina gotûbêj di navbera Dewleta Turkiyê û Ocelan serokê PKK de ye û, piştre Endamên din ên komîtê jî pêdagirî li ser vê yekê kirin.

Destpêşxer û kesatiyên cîhanî, ên ku bangewaza Komîteya aşîtiyê vajo kirine pêk tên ji;

1. Dosmon Toto, wergirê Xelata Aşîtî a Nobêl li Afrîqaya Başûr
2. Cîmî Kartêr wergirê Xelata Aşîtî a Nobêl û serkomarê berê yê Amerîkayê
3. Dalaylama, wergirê Xelata Aşîtî a Nobêl li Tibetê
4. Xozê Ramûs, wergirê Xelata Aşîtî a Nobêl û serkomarê berê yê Teymûra Rojhelat
5. Cêrî Adems, serkomarê Îrlend û serokê Şîn Feyn
6. Îngvar Karlson, serokwezîrê berê yê Sûêdê û sekreterê berêyê sosyal dêmokrata
7. Şêl Magne Bondêvîk, serokwezîrî berê yê Norwêjê
8. Pavo Lîponêl, serkomarê berê yê Fînlendê
9. Anker Yor Gênsên, serokwezîrê berê yê Danmarkê
10. Şêl Olsên, wezîrê berê yê karûbarên derve yê Danmarkê.

Agirî 3

Hejmar 195, 5'ê Çileya Pêşîn a 2012

# Deqê axavtina birêz Hesen Şerefî cîgirê sekreterê giştî ê PDKÎ di konferansa Piragê de



**Konferansa Piragê li jêr nave "Yekîtî bo demokrasiyê li Îranê de" li bajarê pirgê bi beşdariya nêzîk bi 120 kes ji kesayetiyê siyasî û nûnerên partiyên Îranê ên opozisyonê li Piragê de birêve çû.**

**Di heyamê du rojan karê konferansê de beşdaran li ser pirsa demokrasiya li Îranê de, yekîtiya di navbera opozisyona Îranê, û li ser pirsa neteweyan li Îranê de axavtin kirin ku heyeta PDKÎ bi serokatiya rêzdar Hesen Şerefî li vê konferansê de beşdarî kir , û birêz Hesen Şerefî jî axavtinek pêşkêş kir.**

**Hevalên hêja, êvariya we baş!**

**E**z gelek bextewerim ku li xizmeta we de me bona baskirina li ser mijarek giring ku li welatê me de wek rastiyekê heye, lê bi vî awayê ku hewce ye girîngî pê nehatiye dan. Hêvîdarim ku pirs û basên evro li civînên dahatî de zêdetir û rastbînanetir bikeve ber bas.

Sipasiya birêberên vê civînê jî dikim, û hêvîdarim ku berdewam civînên weha hebin. Navê vê civînê ji demokrasiyê ve dest pê kiriye û çavaniya riyek ku divêt em bipîvin bo gihîştina bi demokrasiyê li welatê me de wate Îran. Yekiemîn pirsa ku ji riya dabînkirina demokrasî û gihîtina bi demokrasiyê girîng e bawermendbûna bi demokrasiyê ye.

Wate heke em banga demokrasiyê bin û me bawerî bi demokrasiyê tunebe, em her riyekê bipîvin em nikarin bigîjne armancên xwe ên rastîn. Wate bawermendbûna bi demokrasiyê bi wateya xwe a rasteqîne mercê bingehîne. Em nikarin demokrasiyê li wateya xwe ya rastîn ramalin, û parve bikin û tenê wan beşên ku rê ji bo gihîştina bi beşek ji civaka Îranê bi desepandina deshilatê ye qebûl bikin. Lê ew beşa ku daxwzên neteweyên Îranê û bi awayek giştî daxwaza civatên xelkê Îranê ye li ber çawan negrin yan jî kêmbuha bizanin, li hember vê yekê de ku beşek ji riya demokrasiyê ve bigîjne deshilatê.

Gellek kêm nehatiye dîtin ku ji nivîsîna hinek ji mezinên welatê me ku dema bas ji pirda neteweyên Îranê tê gorê, hestiyariyek bê qas ji xwe nîşan didin, li demekê de ku em çi bixwazin yan nexwazin ew yek rastiyek haşahilnegir e li Îranê de, û ji bona vê ku hêcetan bo wan haşalêkirinên xwe bînin, bas ji vê dikin ku em li ranê de em di gel pirsa netewî berbirû ninin. Bvo mînak Îranê welatek çend netewe ye, û haşalêkirina ji vê rastiyê jî nabe sedema retkirina vê mijarê, yan eva ku Îran neteweyek e ku xwediyê yek xak û yek netewe û yek ziman e. Bi tu awayî ne wisa ye. Yan li rastî de Îran yek netewe ye, hinek alî ser vê bawerê ne ku li Îranê de, yek ji neteweyan ku ez navê wan naînim, netewe nine, bi sedema vê ku serweyî netewe ye. Ên din jî bona baskirinê nabin û li dema herî baş de qewm in. Ez nizanim ku neteweya welatê min çî ye. Dema ku yek ji wan bi sedema serweyînetewebûnê, û ên din jî li şêwaza herî baş de bi sedema qewmbûna xwe hene, û em dîsan li wir de bas ji diyaloga netewî dikin, li welatekê de neteweyek bi tenê tuneye. Yan eva ku pêdagirî li ser qewmbûnê tê kirin, bo çî?

Heke pirs ew nine ku li mafê siyasî û aborî û îdarî ên vê netweyî bêne xwar, çi hokarek din dikare hebe? Çawan ez dikarim bi nifûsa kêm a Ereb li Behrînê bêjim netewe, lê bêjme Erebên navxwe ên sînorên Îran, ku ne netewe ne. Bi çenda milyon Turkên Azerî bêjim ku netewe ninin, lê bêjme nifûsa kêmtir ku li Azerbaycanê de hene, bêjim netewe. Dema ku dipirsim bo çi? Li bersivê de dibêjin ku wan dewlet hene, ala hene, nûnerên wan li NY de hene.

Gelo ew ye dibe? Bê destpêk bas ji vê yekê neke, û eva jî belgeanîn nine li pêxema parastina yekparçeyiya xaka Îranê. Eva bi awayekê tûjkirine bona vê ku heke hûndixwazin ku bibne netewe,herin vî karî bikin ku ên din kirine, û em jî niha pêde wê bi hurmet ve bêjne we "netewe".

Her demekê pirsek derheq bi neteweyan tê holê, hestyarî bilind dibin, em dikarin yekparçeyiya erdnîgariyê û yekîtiya xelkê Îranê bi du awayan biparêzin, yekem ew e ku tepeseriya bi derba serîtevandin û teslîm û ên din ku li salên borî de hebûye û niha jî heye. Şêwazek din jî ew e ku bi dabînkirina mafê neteweyên Îranê, li Îraneke demokratîk de, Îran bibe milkê me hemiyan û em hemû jî li Îraneke demokratîk de beşdar bin û xwedîtiya Îranê vegere ji bo me hemiyan.

Dema ku em qebûl dikin ku Îran a hemû Îraniyan e, wate Îran milkê Îraniyan e. Bo min cihê heyrîmanê ye ku ji bo tak yan komelekê ku milk pîroztir be bo xwedîmilk. Pîrozatiya tiştekê wek hêla sor dadinên, lê xweiyê wê berçav nahê girtin, tu pîrozatiyekê jî jêre berçav nahê girtin, û tu mafek jêre bi rewa nayê dîtin, û heke derfet jî hebe haşa jî lê tê kirin. Ew yek nikare alîkar be jî bo wan nîgeraniyên ku derheq yekparçeyiya coxrafiyayî de heye.

Ya ku wan nîgeraniyan tundtir dike, haşakirina ji hebûn û mafê neteweyan e. Li demekê de ku dabînbûna xwestekên wan, nabe sedema pêkhatina kêmtirîn nîgeranî li wî warî de. Lê heke bi her sedemekê ve em bixwazin ku wan neteweyan li ber çav negrin, me karek kiriye ku ji bav û bapîrên xwe bi cî bimînin. Bapîrên me li Îranê de, ew herêmên ku netweyên Îranê têde akincî ne bi navê heman netewe, binav kirine, Kurdistan, Belûçistan, Azerbaycan û Erebên Ehwazê.

Li wê demê de demokrasî bi wateya evro tunebû, mafê mirov bi wateya evro tunebû, û mezinên me li derbazbûyî de bi wateya evro nasyarî tunebû. Lê min guman têde heye ku heke ew binavkirin ku li vî serdemê de hatine kirin, evro naban û me evro wek neteweên Îranê bas lê kiriba, ku navçên me bi navê neteweyên me bin, renge li gel hemen tometa cudahîxwaziyê berbirû biban. Wate heta ji derbazbûyiyên xwe jî bi cih mane, ew jî li serdemê demokrasî û li serdemê mafê mirovan. Ez pêşniyar dikin hevalên hêja û mamostayên rêzdar, programa partiyên bihêz û bi bandor ên Kurdistanê bixwînin û bizanin ku li cihekî de arîşeyek li ser Îranî bûn û parastina yekparçeyiya coxrafî heye? Ew rêkewtinnameya ku li navbera du partiyên PDKÎ û Komelê nêzîk bi sê mehan berî niha hate îmzekirin, çi kêşeyek pêk anî? Bo çi?

Jiber ku rêkkevtinekê şikil girt ku bi sala ye em tewaya opozisyona Îranê li pey ketine û me nekariye em rêve bibin, lê neteweyên Îranê karîn ku kongireya netewên federal a Îranê gellek bilez û bi hêsanî pêk bê? Bo çi? Jiber ku daxwaz jî yek in û êş û azarên wan jî yek in. Lê opozisyon êş û azarên wan jî ne yek e, û daxwazên wan jî ne yek e. Bi hemû wan hewlên ku me li rûniştinên curbicur de li gel partiyên opozisyon ên Îranî me dane, heya niha jî me nekariye hevpeymaniyekê pêk bînin.

Li wir de bas ji diyalogê hate kirin derbarê hilbijartinên azad. Min pêşniyar bi Şerîetmedarî kir ku nebêje vê yekê "diyalog". Diyalog dibêjne vê yekê ku her kes bi bîrûboçûnên xwe li gel yektir bas ji diyalogê dikin û digîje armancek hewbeş. Ew yek nayê wateya diyalogê. Bangkirina çend kesan li ser raya kesekî yan çend kesan, û ew yek nexweş e ku bi navê me hemiyan tiştek li vî warî de were bilavkirin. Em dikarin kar birêve bibin, hitbarê pêk bînin, Îranê bi milkê xwe bizanin, û eva jî karê me hemiyan e û Îranê em hemû bi ya xwe bizanin, nabe kes xwe ji ên din bi Îranîtir bizane. Bi vê wateyê ku xwe wek xanexwê bizane, û xwediyê poanên taybet be li hemberî neteweyên din.

Em bona derbazbûna ji wan ferq û cudahiyên ku hene, Îraneke demokratîk û federal pêşniyar dikin, Îranek ku milkê me hemiyan be, û em jî hemû bo Îranê û bo demokrasî û mafê mirov li Îranê de hewil bidin, ew yek programa me ye û bi sala ye ku em li vî warî de hewlê jêre didin, lê mixabin ku heya niha tenê tişa ku bo me netewên Îranê berçav hatiye girtin, serkût û tepeserî bûye.

Heta derheq her tawanekê de, li navbera netweyên Îranê de û xelkê din ên Îranê de cudahî hatiye danîn û cezayê wê girantir ji ên din bûye. Renge tenê ji wan tepeseriyan de para me zêde be, û li tewaya mijarên din de bi awayek din bi me re reftar hatiye kirin, em ji bo tewaya xelkê Îranbê rêz û hurmet dadinên. Em curbicuriyê erênî dibînin û vê yekê jî wek dewlemendiya Îranê dihesibînin, û divêt ji vê dewlemendiyê bi awayek erênî mifahê wergirin.

Ez hêvîdarim ku em bi sozdanên bi yektir û baweriya bi yektir û boxtan nekirin ji yektir li dema anîne berbasa daxwazên demokratîk li çarçoveya mafê mirovan de, bi awayekê bi hevre reftarê bikin ku tomet û boxtanan li tu Îraniyekê nekin ku tu Îraniyek nekare tab û tehemula vê boxtanê bîne.

# Nirxên Azadiyê



Selîm Zencîrî

Şoreşa ku xelkê Sûriyê di destpêka sala 2011'an de dest pêkir, wa derbasî 21'mîn meha xwe bûye.

Şoreşek ku berevajî çavnihêriyan, demdirêj û pir zirar bûye. Nirx û bedelên ku gelên Sûriya ji vê şoreşê re dan, li her biyavî de kêmwêne ne. Pêka serhejmariya NY, zêdeyî nîv milyon kes penaber û aware bûne û her roj bi hejmara wan zêdetir dibe.

Herweha zêdeyî 40 hezar kes jî hatine kuştin ku beşek zaf ji wan jin û zarok in. Eva jî bimîne ku jêrxana aborî a welat bi tewahî têk çûye û renge çendîn salên din jî nekare vegere ser halê berê û li ser lingên xwe bisekine. Ya balkêş û girîng ewe ku dewlet û desthilata dîktator a Sûriyê çiqas hovêtî û givaşên xwe zêdetir dike, îrade û vîna berxwedanê jî xurttir û qahîmtir dibe. Wate êdî nema rejîm paşde vegere rewşa du sal berî niha û her roj zêdetir li nav kirîz û qobiyê de diçeqe.

Gotinek pîr û kalên me heye ku dibê "xwedê neke gurola kesê bikewe serjordahiyê", li rastî de rewşa Esed jî ev e. Helbet ne ji bextreşî û mezlûmiyetê re, belkî li ser zikreşî, tawanbarî û zordariyê. Lewma Sûriyê niha li ber guherînek mezin de ye û her ku diçe girovera dora Esed û rejîma wî jî teng û tengtir dibe. Li asta navxweyî de opozîsyona Sûriyê kariye heya qasekê xwe organîze û bi rêxistin bike û derbên giran ji peykerê nîzamê û sînorê desthilata wê bide û beşa herî zaf a xaka welat jî bixe bin kuntirola xwe, bi taybetî ku beşa kurd akincî a wê (kurdistana Sûriyê) mijûlê xwebirêveberiyêk herêmî ye û her roj jî xîmê desthilatdariya wê bihêztir dibe.

Li asta derekî de jî e m dibînin ku eniyek yekgirtî û bihêz a deverî û navnetewî li hember Esed de pêkhatiye û dixwaze bi alîkarî û piştevaniyên madî û menewî ên xwe dawiyê bi temenê faşîzma Beis bîne . Bêhêvîbûna hevalbendên Esed

Wekî xuya, bi dirêjbûna şoreşê û ektîvbûna rola ekterên deverî û cîhanî li dor Sûriyê êdî dost û hevalbendên Esed jî ketine tengasiyê û bêhêvî bûne ji parastina Esed û desthilata wî. Serbarê wê ku Sûriyê pêgehek stratejîk û girîngiyek siyasî a taybet bo Îran û Rûsiya heye û jê weke pir, mertal û qadek bo teswiye hesabên navnetewî ên xwe mifahê distînin, lewma bi nemana Esed hevkêşeyên siyasî ên deverê jî dê biguherin û dîzaynek nû jêre bihê kirin û her wekî Kondolîza Rays, Wezîra karê Derve a berê ya Amerîkayê ragihand, renge bibe dawîn beşa piroseya hiloşîna Rojhilata Navîn.

Hewla Îranê bo nifûza li nav opozîsyonê de

Yê ku li vê navberê de herî nîgeran e rejîma Îranê ye. Ji ber ku givaşên hevbendiya nû a opozîsyona Sûriyê bi piştewaniya Komkara Erebî, DYA, YE û Turkiyê li dijî rejîma Sûriyê û pêşrewiya zêdetir a wan morala rayedarên Îranê tevlihev kiriye û ew pitir ji her demekê nîgeran kirine.

Bi danekewe û nebe alîkarek ji muxalîfan re bo herifandina Esed ...

Bijardeya leşkirî take rêçare!

Mijara Sûriyê bi rastî jî aloz û cuda ye û weke kurd dibêjin "ev hewîre gelek avê vedixwe".

Ji ber ku dest û piyê gelek aliyan pêre girêdayî ye. Her yek ji wan ektoran dixwaze gor dilê xwe pirsa Sûriyê çareser bike lê ne bi tena serê xwe û hêza xwe.

Lê piştî hewildanên bêencam û jordeçûna hejmara qurbaniyan hêdî hêdî bawerî û zîhniyetek çê bûye ku bi riya leşkirî ve dawî bi cinayetên rejîma Esed bihê anîn. Bona wê yekê jî hin amadekariyên destpêkî dixuyin. Di serî de bi fermînasîna hevbendiya nû a opozîsyonê weke nûnerê rastîn ê xelkê Sûriya, paşan amadekariyên Îsraîlê bona parastina sînorên xwe ji riya lawazkirina Hemas û Cehada Îslamî, herweha pirojeya bicih kirina fûze û mûşekên Patiryot ên NATO li ser sînorê Sûriya-Turkiyê.

Herweha hewla pêkanîna hikûmeta veguhastî ji aliyê hevbendiya opozîsyonê weke alternatîv û dawîn hewil jî daxwaza Exzer Îbrahîmî, nûnerê NY bo kar û barên Sûriyê ye ku dide zanîn pêla şer û pevçûnên li Sûriya gelek berfireh bûye û tenê rêçareya leşkirî dikare dawiyê bi vê kirîzê bîne. Lewma wusa dixuye ku dibe êdî rewş yekalî bibe. Wekî dibêjin çiqas av boştir be, aş jî xweştir e. Bi vê wateyê ku çiqas givaş zêdetir wê zûtir şoreşbigihîje encamê û nirxên ku gelên Sûriya ji azadiyê re dane, wê tamê bide jîn û jiyanê.




## Kesayetiyê welatparêz yê herêma Urmiyê koça dawiyê kir



**Roja 8'ê sermaweza 1391'an, Hecî Xalis Natiq, bavê Dara Natiq, pêşmergê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, û endamê Komîteya Navendî a vê Partiyê, bi hegera nesaxiyekê, li temenê 85 saliyê de, çû ser dilovaniya xwedê.**

Hecî Xalis kurê Ehmed, sala 1306'an a Rojî, li gundê Tendrûkê (Omer Abad), li devera Enzela ser bi bajarê Urmiyê, hate dinê. Hecî Xalis, mirovekî welatparêz û pêşmergedost û kesayetiyek xwedî nifûz yê devera Urmiyê bû.

Navbirî bi hegera xebat û beşdariya xizm û kes û karên wî di tevgera azadîxwaz a Kurdistanê de, çendîn carî ji aliyê rejîmên Paşayetî û Komara Îslamî a Îranê ve, hatiye binçav kirin û eşkencekirin, bi taybet di serdemê rejîma Paşayetî de, bo heyamê heft salan hate girtin.

Hecî Xalis, mamê du şehîdên PDKÎ ye bi navên Heyder Natiq û Şewêş Natiq, ku ji aliyê rejîma Îranê ve hatin şehîdkirin.

Termê pîroz yê Hacî Xalis, roja 9'ê Sermawezê, ji aliyê kes û kar, û xelkê welatparêz û şoreşvan yê bajarê Urmiyê ve, di goristana Mîrawa, li bajarê Urmiyê de, bi axê hate sipartin.

Em wek duheftînameya Agirî sersaxiyê dibêjne xizm û kesûkarên Hecî Xalis, bi taybetî kurê wî ê pêşmerge Dara Natiq, û xwe di xema wan de beşdar dizanin. Riha wî şad be.

## Bikujên Setar Bihêştî gef li dayîka Setar xwarin



**Dayîka Setar Bihêştî ragehand ku hukmê destbiser kirina keça min nîşanî min dan û gotin; Yan divêt tu vê nameyê vajo bikî, yan jî keça te wê bê girtin, ez neçar mam ku rizayetnamê vajo bikim.**

Goher Bihêştî derheq sitandina rizayetê ji malbata xwe dibêje ku, ez digel bikujên Setar berbirû kirim û bi min re gotin, hekî rizayetê nedî, emê keça te destbiser bikin. Setar Bihêştî çalakvanê întêrnêtî ê 35 alî, roja 9'ê Xezelwerê hate destbiser kirin û piştî çend rojan di girtîgehê de canê xwe ji dest da.

# Ew xebata medenî ku Turkiye hejand



Şehab Xalidî

**H**erçed ku Turkiye welatek demokratîk, laîk û xwediyê wan norm û pîvanan e ku welatên Ewropayî peyrew dikin, lê careser nekirina pirsa Kurd ji aliyê deshilatdarên wî welatî ve hem riya endametiya wî welatî li YE de asteng kiriye û hem jî nebûna asayiş û ewlehiyê li sînorên wî welatî de bi sedema vî şerê çekdarî ku niha heye, nerizayetiyek zêde ji qas di nav akinciyên wî welatî de pêk aniye.

Dewleta Turkiyê îdiaya vê yekê dike ku bi zora hêz û operasyonan dikare ewlehiyê di nav welat bi taybetî li sînorên xwe de cihgir bike, lê aliyê din jî bi şerê tundûtîj ê çekdarî dixwaze biselimîne ku heya dewlet pirsa Kurd çareser neke, Turkiye jî rûyê ewlehiyê bi xwe ve nabîne.

Bê guman ew yek rohn û eşkere ye ku tu yek ji wan aliyan hêz û şiyana gihîştina bi armancên xwe bi zora çekê tuninin, û riya herî baş bona vegerandina ewlehiyê bo welat, ragirtina şer û hewildan bona mifahwergirtina ji riyên aştîxwazane û dûr ji tundûtujiytê bo çareserkirina kêşe û arîşeyan e. Yek ji wan riyên aştîxwazane û dûr ji tundûtujiyê pêkanîna meşên berfireh, daxistina dukan û bazar, birêvebirina mîtîngên berfireh ên siyasî, girevgirtin û xebata parlemanî ye ku dikare li astek berfireh de bê birêvebirin, û deshilatê neçar bi pêdeçûna bi ser siyasetên xwe de bike.

Her di vê çarçoveyê de ew xebata medenî ya ku beşek zaf ji Kurdan li Turkiyê de heya niha bi awayên curbicur birêve birine, şiya ye ku pirsa zindîtir li her demekê ragire û gellek alîgiran heya li nav gelê Turk de jî ji gelê Kurd re peyda bike û li cihê nîşandana dîmenek şerxwazane ji takê Kur, dîmenek aştîxwazane û pêşkewtî ji takê Kurd li mêjiyê her mirovekî azadîxwaz de pêk bîne.

Ew gireva ku 682 girtiyên Kurd li 67 girtîgehên Turkiyê de ( li gorî ragehandina wezareta Dozgeriya Turkiyê) bo heyamê 68 rojan birêve birin, wek yek ji riyên aştîxwazane ên eşkerekirina nerizayetiya ji siyasetên deshilatê, di rastî de karî heta sînorên Turkiyê jî bibezîne û piştevaniya Kurdan li cihên curbicur bo aliyê xwe rakêşe û dengdanek zaf di nav ragehandinên giştî ên cîhanê de hebe û heta bibe yekemîn û



girîngtirîn nûçeya mîdyayên cîhanî, û bi vî awayî alîgirek zaf bo daxwazên rewa ên Kurd heta li astê derve a Turkiyê de peyda bike û dîmenek belengazane ji gelê Kurd nîşanî xelkê cîhanê û raya giştî bide.

Di hemen dem de girevgirtiyan bi vê xebata medenî û bi vê berxwedana şoreşvaniya xwe, li derveyî girtîgehan de jî xortên gelê Kurd bi girev û meşên berfireh ên berdewam bona piştevaniya ji wan girtiyên girevgirtî, deshilat neçar kirin ku bîr ji rêçareyekê bilez bike bona dawîanîna bi vê gireva ku renge li dema mirina her yek ji girtiyan de, Turkiye li gel rewşek gellek bi tehlûke a çavnihêrnekirî berbirû be. Lewra jî ji aliyekê alîkarê serokwezîrê Turkiyê Bolent Arînç ragehand ku emê hewil bidin, ku rê ji bo bendiyên Kurd xweş bikin, bona vê ku bikarin li dadgehên Turkiyê de bi zimanê dayîkê bergiriyê ji xwe bikin, û ji aliyek din ve hewara xwe birne ber Îmraliyê û bi vî awayî roja 18'ê Novambrêgirtiyan dawî bi gireva xwe anîn.

Bêguman her wek dîroka xebata medenî û dûr ji tundûtjiyê li gellek welatan de selimandiyte, ew şêwe xebata baştir dikare xelkekî zaf li dewra tex û qatên curbicur li dewra armancek rewa û hewbeş kom bike û piştîwaniya derve – bitaybetî di vê serdemê de ku her şêwe xebateke çekdarî dikeve çarçoveya girupên terorîstî de – bo aliyê xwe rakêşe. Li Turkiyê de jî Kurd bi berdewambûna li ser vê xebata medenî û cemawerî a xwe û bi taybetî ji riya nûnerên xwe li parlementoya Turkiyê de dikarin bi moraleke bihêz a netewî, bergiriyê ji daxwazên xwe ên rewa bikin, û bona gihîştina bi mafên xwe tekoşînê bikin.

## Sinaya Amerîkayê tehrîmên nû li dijî Îranê pejirandin



**Civata Sinaya Amerîkayê, bi 94 dengên erênî, biryar da ku ticareta filizên giranbiha, pola, Alminyom, rejûya Kok û girafîtê, digel Komara Îslamî bêt qedexekirin.**

Herweha di biryarê de firotina nermefzarên pîşeysazî ên peywendîdar bi kertê enirjî û gemîvaniyê bo Îranê hatiye qedexekirin û herweha hinek rê û cihên taybet jî bo qedexekirina guhertina gaza Îranê digelê zêrê Turkiyê li ber çav girtine.

Di beşek din ya biryarnamê de saziya Deng û Reng a Komara Îslamî a Îranê, û serokê vê Îzetullah Zerxamî, seba belavkirina îfadeyên bi zorî ji neyarên xwe, weke binpêkerên mafê mirov dan nasîn.

## Kuştina pasdarên Îranî di Sûriyê de rewa ye

**Yek ji kesatiyên naskirî di nav refên hevalbendiya dijberên Esed de, bi awayek eşkere kuştina pasdarên Îranî li Sûriyê de, bi rewa zanî.**

Hêysem Elmalêh, yek ji endamên payebilind yê hevalbendiya nû ya dijberên Sûriyê, di hevpeywînekê de digel rojnameya Îraqî ya Elzeman de ragehand ku, dijberên Rejîma esed mafê vê yekê hene ku her Îraniyekê ku di Sûriyê de bibînin qetil bikin.

Navbirî di doma gotinên xwe de eşkere kir ku rejîma Îranê bi piştevanîkirin ji rejîma Esed, di cinayetên wî de beşdar e, û bûye sebeba kuştara xelkê sivîl, lewra min daxwaz kiriye ku endametiya Îranê di Konfiransa Îslamî de bê sekinandin.



# Rojavayê kurdistanê!,derfetek din yan metirsiyek din?



Sarya Azer

**K**urd weke mezintirin kêm netewe li Sûriyê, îro xwedî giringiyeke teybet û çarenûssaz e, di rewşa gîştî ya wî welatî de.

Înkara hebûna wan di 50 salên borî de li wî welatî Kurd weke mezintirîn putansiyela guhartinê di rewşa Sûriyê de derxistiye pêş.Her çiqas ku Beşar Esed bi danîna mafên civakî-siyasî û nasnameyê ji Kurdan re xwest ku rê li ber tevlîbûna wê potansiyelê di guhartinên Sûriyê de bigre, lê di rastî de armanca paşeroja siyasî ya Kurdan bi xwe mezintir ji derfetên weke nasname û çêkirina partiyên siyasî bûn.Kurd li wî welatî di fikra guhartina rejîmê û çêbûna sistemeke federalî de ne ku bi hezîneyek kêm û bê tunûtîjî rê li ber beşdariya wan di desthilatdariyê de vedike.Lê daxwaza federalîzmê ji aliyê Kurdan ve bi çendîn astengên bingehîn re rû bi rû ye.

Yek ji wan hêza mezin ji opozisyona Sûriye ye ku ji Erebên suniyên ser bi Îxwan-Elmuslimînê pêk tên. Ev deste ji opozisyonê, ji aliyê çek û alîkariyên madî ve ji bal Erebistanê, Qeter û Tirkiyê û her weha Misrê ve tên piştevanîkirin. Tê zanîn ku di paşeroja Sûriya de, paş Beşar Esed, ew bi navçeyeke serbixwe ya Kurdan re hemfikir nînin û dijberiyê dikin. Ev yek di gotinên Burhan Xeliyûn de derket ku di rûniştina Stenbolê de dabû zanîn ku li Sûriyê ciyek bi navê Kurdistanê nine, û kêşeya Kurdî li wî welatî de nas nakin. Her wuha tirsa Tirkiyê ji çêbûna navçeyeke serbixwe ya Kurdan li Sûriyê jî faktoreke esasî ye di rêgirî ji wê daxwaza Kurdên rojava de, û herwuha metirsiyeke li ser deverên kurdan.

Tê zanîn ku artêşa rêjîmê ji devrên kurdan hatibû kişandin û artêşa azad jî li wan deveran nebûn. Ev yek derfetek bû ku li rojavayê kurdistanê xeyala çêkirina navçeyeke serbixwe bi modêla Herêma Kurdistanê, partiyên Kurdan bigehîne hev. Lê rewşa îroyin ya Serê Kaniyê nîşan dide ku Kurdan li wê deverê ne tenê bandora faktorên derekî yên navnetewî û qeyrana Sûriyê bi giştî berçav negirtine, heta wan bixwe jî şiyana hevgirtinê û avakirina yekitiyê di wê rewşê de ji xwenîşan nedan.Her di vî warî de li ser şiyana hêzên siyasî yên Kurdan li Rojava çendîn faktor derdikevin hole, ku nîşan dide di pêşvebirina daxwazên xwe de, nikarin wan berçav negrin.

Yek ji wan ew e ku ew xwedî hêzeke hevgirtî ya siyasî-leşkerî nîn in. her wuha li gor parçeyên dî yên Kurdistanê dîroka xebateke dûrûdirêj ya siyasî û leşkerî di wê beşê de kêm e.

ew yek jî di giraniya siyasî ji bo pêşvebirina daxwazên wan bandorek negativ dike. Lê sedema herî girîng li gor min ew e ku li hember faktorên derekî weke têkiliyên artêşa azad bi welatên îslamî û her wuha mercên navnetewî, navçeyî û qeyrana Sûriyê,hêzên Kurdî xwedî stratejiyeke hevbeş û diyarkirî nînin.

Renge mirov heq bide nîgeraniya Kurdan ji helwesta opozisyona Sûriyê li serkêşeya Kurd li wî welatî û gumana wan li rewşa siyasî-civakî ya paş Esed, lê tê zanîn ku tevî hebûna kêmnetewe û olên cudacuda di wî welatî de, neteweya Ereb di guhartinan de rolek mezin girte ser milê xwe û buhayek mezin daye û diyar dike wê di pêşeroja Sûriyê de xwedî giraniyeke siyasî bin.

Her wuha rewşa qeyranî (bi kirîz) ya tekiliyên Sûriyê û Tirkiyê her çiqas ku derfetek bû ji Kurdan re, lê rewşa Serêkaniyê da nîşan dan ku nebûna nêrîneke hevbeş li ser mafên neteweyî di nabvera hêzên Kurd de, ew derfet vegerandiye metirsiyekê li ser deverên Kurdan.

Bi giştî tê zanîn ku Kurd li rojavayê Kurdistanê ji bo pêşvebirina daxwazên xwe yên siyasî-civakî,bê berçav girtina rewşa bi kirîz ya Sûriyê, mercên navnetewî û ya herî girîng mercên pozîtiv û negatîv ên li ser dawaza wan ya modêla federalîzmê di wî welatî de, nikarin di pêşerojê de gav bavêjin.

# Turkiye daxwaza vegerandina cezayê îdamê dike

W: Muitesem Nûranî

**R**ojnameya Gardiyan, gotarek li jêr serxetê Turkiye axavtinê li ser vegerandina cezayê îdamê dike.

Herçend Turkiyre ji aliyekê ve hewil dide ku bibe endamê YE û xwe wek welatek ewropayî dihesibîne, û ji aliyek din ve hewil dide ku bi awayekê pirsa Kurd li vî welatî de ji stûyê xwe derxe, her raê biryarekê dide.
Orhan Welî helbestvanê Kurd li warê her tişt ji nişkêve dibêje ku her tişt ji nişkêve rû dide. Rê, pîşik,xelk...hwd, li vî welatî de evîn û hezkirin heye, ew jî ji nişkêve. Li wan dawiyane de siyaseta Turkiyê berev armancek taybet çûye. Ber bi serhildana hinek hereketên hevşêwe.
Bo yekem car payîza evsal dewleta Erdoxan serokwezîrên welat, gelaleyek behshilgir derheq pêşgîrîkirina ji berxwe birina zarok li zikê dayîkê de, şande parlementoyê û boçûna wî serî negirt û niha jî gelaleyek din şandiye parlementoyê bona vê ku cezayê îdamê dîsan vegere nav destûra bingehîn a wî welatî de. Carek din hemwelatiyên Turkiyê li her cihekê bin serê xwe dixorînin û carek din bîr ji vê dikin ku bizanin bo ew pirsa cihê heyrîmanê hatiye gorê. Bo tewaya ragehandinên giştî û rohnkirinên mîdyayî ên Turkiyê cihê pirsê ye ku gelo hikumet cezayê îdamê wê bikete bendeke destûrî a wî welatî? Heke dike, bo çi niha?
Erw kêşe demekê serî hilda ku Erdoxan destpêka meha borî li civîna AKP de got ku Turkiye divêt cardin cezayê îdamê li destûra bingehîn a wî welatî de danê û piştre dawa li beşdaran kir ku bi eşkere raya xwe derheq vê boçûnê eşkere bikin û ew gotinaxwe jî çend caran eşkere kir.
Pirs ew e ku ew pirsa girîng li cihên giştî de bête ber behs, ew yek li nav xelkê de bûye behsek girîng.
Piraniya lêkolerên siyasî, û mîdyayan jêve ne ku hem bi armanca rakêşana bala cemawerê Turkiyê bo aliyê xwe beriya hilbijartinên serkomariyê li sala 2014 ku renge xwe berbijêr bike, hem Erdoxan dixwaze li gel Kurdan bisaze û vê meselê bike parsenga çareseriya kêşeya Kurd, û bi mafeke kêm Kurdan razî bike, ku eva tu gumanek têde nine ku bas ji cezayê îdamê dike, û kêşeyek bi navê kêşeya Kurd li qopiyekê de gîr kiriye û nahê çareser kirin, Kurdan mafê wan e ku ji vê pirsê nîgeran bin. Kurd ji hikûmeta Turk xatircem nînin, jiber ku piştî avakirina Turkiyê her le gel wan nerast bûne, ew jî neteweyek mezin in li Turkiyê de.

Her piştî axavtina Erdoxan beşek ji girtiyên Kurd dest kirin bi girevê û hêdî hêdî li tewaya girtîgehên bajarên Kurdakincî ên wî welatî de, 700 girtî bo heyamê 67 roj bo sitandina mafên xwe ên rewa dest bi girevê kirin, ew hereketa girtiyan bû xzebateke cemawerî û heta Leyla Zana jina xebatkar ku heyamek zêde li girtîgehên Turkiyê de bûn, û li sala 1995 xelata mafê mirov wergirt û pênc parlementerên dinê jî bi girevê piştevanî ji girtiyan kirin, digotin ku divcêt mafê wan hebe ku li dadgehan de bi zimanê Kurdî ji xwe bergiriyê bikin, rêberê Kurd Ebdulla Ocelan ku sêzde sal e li benda Turkan de ye, li Îmraliyê de were azadkirin, û perwerde bi zimanê Kurd li herêmên Kurdakincî bibe fermî.

Diyare ku girevgirtiyan bi biryara Ocelan dawî bi girevê anîn, ew yek jî derdixe ku xebata xelkê Kurd li bakûrê Kurdistan berheq û rewa ye, û xebata berdewam ya PKK bandorek berçav heye û axavtina Rêzdar Ocelan vê carê jî selmand ku tenê bi qisa wî, girtiyan dawî bi gireva xwe anîn û her ew e jî ku axavtina yekem dike û dewleta Turkiye divêt vê rastiyê qebûl bike ku xebata Kurd li vî welatî de çi li girtîgehan û çi li çiyayan û çi jî li ser şeqaman ji hev cuda nabe. Tenê riya çareya kêşeya Kurd rê çareya aştiyane ye.

**www.Guardian.com**

# Komara Îslamî û pêşerojek reş



Pêyxam Hişmetî

Di 10`ê Xakelêweya 1358`ê de, Komara Îslamî ket ber refrandoma ne demokratîk û ne azad ku têde û li gor îdea û gotina rayedaran ji sedî 98.2`ê beşdaran deng dan vê sîstemê û bi vî awayî pergala desthiladtar li ser Îranê ji Şahenşahî ve bi Komara Îslamî hat guhertin. Ezmûna tehl a ferzkirina Komara Îslamî bi ser gelên Îranê di sala 1980`î de ji aliyê Xomeynî derxist holê ku ji nava referandomek ne azad de dikare şekl û metoda herî dîktator derkeve.

Piştî demekê Qanûna Bingehîn a Komara Îslamî kete ber rapirsiya giştî û hat pejirandin. Li gor Qanûna Bingehîn a Îranê, divê ``esl û bingehên Hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê li ser bingeha cumhuriyet û îslamiyetê bihatibana avakirin, cumhuriyet ango heman deng û îradeya xelkê di rêvebirina kar û barên welat û îslamiyet bi wateya guncandina qanûnan li gor ola Îslamê. "Lê ne eva ku "Weliyê Feqîh" (nayîb û wekîlê temam) bibe bingeha Komara Îslamî ya Îranê û bi baweriya hinek Şîeyan di dema nebûn û xeybeta Îmamê xayîb, "Feqîh" li gor mercan wek "Weliyê Feqîh" erkên wî Îmamê di xeybetê de rêve bibe.

Ev bîrdozî ji aliyê Xomeynî ve ket berbas û proje û bîrdoziyên şibê wê di berhemên oldarên din de jî tên xuyakirin. Lê bi rastî di bin sîvana bîrdoziya `Welayeta Feqîh` de, dema xwe Xomeynî û niha jî Xameneyî bûne astengên herî mezin ên tevgera azadîxwaziya neteweyên Îranê.

`Weliyê Feqîh` ku Serokê Olî yê Komara Îslamî ya Îranê ye, rayedarê yekem û herî bihêz ê welat tê hesibandin û hemû rêveberiya welat di destê wî û di bin çavdêriya wî de tên rêvebirin û li jêr çend dezgeh û saziyên olî hene ku endamên wê hemû ji aliyê wî ve tên destnîşankirin! Biryar bû li Komara Îslamî de hemû partiyên siyasî serbest bin, ji xeynî ku heman salê hemû partiyên siyasî yên demokrat, sekolar û çepgir hatin qedexekirin, heta partiyên Îslamîst ên qanûnî jî ku hinek rexneyên biçûk ji desthilata `Weliyê Feqîh` girtin, hatin qedexekirin.

Biryar bû desthilata rêvebirinê di nav sê dezgehan de bê parvekirin, lê niha her sê dezgehên rêveberiya Îranê bûne saziyên bê kêr û liqên bîroya rêberê olî. Her zû îradeya neteweya Fars bi ser hemû neteweyên Îranê hat ferz û serdestkirin û hemû qadên hikûmetê cewhera îdeolojîka olî li xwe girtin û heta niha jî her bi vî awayî dimeşe. Cewhera etnîkî ya wan Farisî be û hemû pêkhateya civakê li ser zimanê Farisî bê xapandin û rêvebirin, di rewşekê de ku tenê ji sedî 30`î nifûsa Îranê pêk tînin. Ango kêmaniyek biçûk li ser pirraniyek mezin hat ferzkirin.

Şoreşa sala 1979`an a neteweyên Îranê bi keda şoreşger û azadîxwazan serket, lê komek kesan hemû destkevtên şoreşê qorix kirin. Piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê, desthilatdarên Komara Îslamî du riyan zêdetir pêşiya xwe nedidîtin. Yan Bi tebahî ligel xelkê têhniyê azadî û dijî dîktatoriyê bersivderê xwestek û daxwazên azadîxwazane û demokratîk ên gelên Îranê be û hevî û azadiyan di nav civakê de bimeşîne yan dest bi qirkirin, tundûtûjî, îşkence û îdamkirina di nav civak û girtîgehan de bide. Bêguman wan desthilatdarên hov û kevneperest rêya duyemîn hilbijartin û her ew jî li wan dihat çaverêkirin.

Hemû desthilat û biryarên welat di destê Xameneyî de ne. Divê hemû karbidest peyrew û derwêşên wî bin, tu dijberek qanûnî û aştîxwaz jî napejirîne. Sîstem bi tevahî mîlîtarîze û dîktatorîze bûye. Her dengek nerazî û dijber tê fetisandin, rejîma Îranê bûye dijberek mezin a azadiyan. Civaka sivîl tu rolek di rêveberiyê de nine. Her cure meş û tevgerek sivîl û aştîxwazane jî ligel qirkirinê rûbirû dibe. Tenê dengek heye ku ev jî yê îdeolojiya rejîma desthilatdar e û bes. Îran bi siya vê hikûmetê bûye yek ji welatên cîhanê ku ne wekhevî û cudahiyan li hemberî gelên wî welatî pêk tîne û maf û azadiyên wan binpê dike.

Komara Îslamî nikare guhertinan di xwe de pêk bîne û tenê hêza xwe daye ser kuştin, darvekirin û xof û geflêxwarinê. Demokrasî eslek cuda û dûr e ji vê hikûmetê û bêhna wê jî ji vê sîstemê nayê. Çanda siyasî ya îdeolojîk sîber daye ser hemû welat û tu xeberek ji demokrasî, tolerans û sîstemek modern tune ye. Binpêkirina mafê mirov êdî bûye beşek ne cudakirî ji pêkhateya vê rejîmê ku ligel konvansyon û peymannameyên navneteweyî bi tu awayî lihev nayên. Piştevanê hêz û aliyên terorîst e û bi eşkere terora siyasî kiriye û dimeşîne. Bingeha aloziyên li herêmê ye û ji ber siyasetên xwe yên şerxwazane niha ligel dorpêç û boykotên herî xurt ên dîplomatîk û aborî di wan salî borî de rûbirû ye.

Êdî ne dema berê ye ku karîn gelên Îranê bixapînin, asta xwendewarî û zaniyariyên hevwelatiyan jorde çûne û bi rêya masmedyayê û alavên curbicur ên peywendiyan her roj tevnên civakê nêzîk hev dibin û sînor ji nav diçin. Xebat bo ji holê rakirina vê sîstema olî û dîktator hevdem ku programa opozîsyona demokrat û şoreşger e, hêvî û xwesteka pirraniya xelkê Îranê û nemaze ciwanan e. Sîstemek ku pirraniya ciwanan wê nexwazin û bi dijmin û sebebê paşdemayîna xwe bizanin û red bikin tu encamek ji xeynî nemanê nabe. Çareser jî Îranek demokratîk û federal e ku xwestekên hemû gelan têde were dabînkirin.

Rojev

## Riya şandina çek û teqemeniyan bo Hemasê

W: Kamyar

Rojnameya Lubnanî ya Elexbar di raporeke xwe de bas ji vê yekê dike ku Girûpa Felestîniya Hemas li kertê Xezê çawan çek û teqemeniyên xwe dabîn dike û herweha rola rejîma Îranê derheq vê yekê dixe ber bas.

şerê ku di navbera Îsraîl û kertê Xezê de çê bû, di warê leşkerî û îtilaatî ve pir giran bû, lê Îsraîlê nekarî bi tewahî riya anîna çek û teqemeniyan bo Kertê Xezê bigire. Jiber vê ku Felestîniyan di çend rojên derbasbûyî de karîbûn ku hijmarek zaf ji mûşekên dûrhavêj ji Hizbulahê wergire û di vê navberê de pirsa şandina çek û teqemenîan ji aliyê rejîma Îranê ve berdewam bû.

Despêka şandina çek û teqemenîan bo Kertê Xezê di çend rojên borî de, Îran û Benderên Sûriyê bûn. Piştî wê ji wan du cihan çek û teqemenî bi welatê Sûdanê re dihatn şandin û paşan li riya Herêma Sîna li Misrê, digehandin Kertê Xezê.

sitratijiya şandina çek û teqemeniyan bo Felestînê, herdem hatiye eşkerekirin, lê serdemê herî berçav ya vê dehsalên 90'î ne ku, Hizbullaha Lubnanê biryar da ku yekîneya taybet bi şandina çek û teqemenîan ava bike. Di wan salan de seba pêkanîna rewşa tund ya ewlehî di Welatên Ordun û Misrê de, şandina çek bo Xezê pir zehmet bû, bi avayekê ku şandina bi tenê yek Xumpareya sivik weke deskevtek mezin dihat hesibandin. Hizbulahê di wan salan de karî ku şandina çekan bo Xezê ber bi zêdebûnê ve bibe, lê Artêşa Îsraîlê gelek zûtir ji hebûna kanalên qaçaxa çekan bi vê herêmê hatibû haydarkirin û karî ku, gelek ji wan kesên ku di pêvajoya şandin û qaçaxa çek û teqemenîan bo Kertê Xezê dest hebûn ji nav bibe.

Piştî derketina Îsraîlê ji Kertê Xezê di sala 2005'an de, aliyên siyasî ên Felestînê dest avêtin pirçekkirina xwe, lê dewletên Ordon û Misr arîşeya herî mezin bûn li ser riya anîna çekan bo Kertê Xezê. Çûnkî sînorên hevpar digel Felestînê ji aliyê wan ve dihat kontrolkirin. Lewma kanalek peywendî girtinê ya hewpar li navbera Sipaha Pasdarên Komara Îslamî, artêşa Sûriyê, Hizbula û Hemasê bo dabînkirina çekan bi Felestînê re hat avakirin.

Di Felestînê de baskên weke Cehada Îslamî, Eniya xelkî ya Azadîxwaz a Felestînê, beşek ji endamên Şehîdên Eleqsa, hêzên Selahedîn û herweha Fermandariya Eniya Xelkî a Azadîbexş Felestînê jî, girûpên beşdar di kanala peywendiyê de bûn.

Ji sala 2005'an ve heya niha, yekîneya şandina çekan, karîne ku her cure çekên sivik û giran, Xompare, Mûşekên Dûravêj û nêzîkawêj, teqemenî û alavên çêkirina rakêt û bombeyan bigehînin Kertê Xezê. Wan yekîneyan hewla şandina bi sedan balafirên şer ji Xezê bo Îran û Sûriyê dane û herweha hêzên Felestînê di wan du dewletan de taktîkên leşkirî û şêwaza bikaranîna kerestęyên leşkerî ên taybet ên dije tank û dije balafir hîn bûn.

# Rojek cîhanî bo jinan, jî!



Arif Vêlzî




Roja 25'ê November ku ji aliyê NY ve, weke roja cîhanî a nehêlana tundûtîjî li dijî jinan hatiye diyarîkirin, salvegera yek ji wan karesatên mirovî ye ku derheq jinan hatiye encam dan. Ev jî ev e ku di wê rojê de û di sala 1960'î de, sê xaşkên Mîrabal ku bona bidestveanîna azadî û yeksanî di welatê xwe de çalakiyên siyasî û civakî dimeşandin,li hember dîktatorîya Lêonîds Troxiyo li Komara Domînîkenê de berxwe dan, lê ji aliyê hêzên ewlehî ên ser bi deshilatê ve hatin destbiserkirin û piştî destdrêjiyên cinsî û îşkenceyên zaf bi avayek hovane hatin kuştin.

Li gor pênaseya NY, her cure riftarek ku bibe sebebê xisarên bedenî, cinsî û derûnî, weke tundûtîjî tê hesibandin. Lewma niha di sedsala 21'an de em dibînin ku di piraniya welatên pêşketî û xwedî demokrasî de ku yasayên bingehî ên xwe li ser esasê peymannameya cîhanî a mafê mirov û konvansyonên ser bi vê ve darêtine,tundûtîji ya li hember jinan bi her awa û şiklekê be, bi tawan tê hesibandin û ceza pêre hatiye diyarîkirin.

Lê di civakên kevneşop û deshelatên dîctator de, bi hêceta parastina buha û nirxên çandî, kevneşopîî, olî û mezhebî, ku piraniya wan li dijî azadî û kerametên mirovî ên jinan in, dest diavêjin tundûtîjî û binpêkirina mafên herî despêkî ên jinan. Komara Îslamî a Îranê jî, yek ji wan hikûmetane ku her di despêka hatine serkara xwe de, ev kesên ku tundûtîjiyên weke hicaba bi zorî, kêmkirina temenê zewicîna jinan, rêgirtin ji xebitîna jinan di hindek waran de, rêgirtin ji hilbijartina cihê jiyana xwe û ...htd encam didan, di bin per û balên xwe de weşartin, da ku bibe handerek bo sepandina meremên xwe ên dijî mirovî. Piştî refrandoma ku di sala 1358'ê de birêve birin, bi avayek farmî û yasayî Komara Îslamî ji bilî ferq û cudahiyên olî û mezhebî, ku bi tundûtîjî li dijî jinan tê hesibandin, jiyana jinê di çarçoveya mal û xwedîkirina zarokan pênase kirin û bi vî awayî, diyardeya kevneşopane a tundûtîjî li hember jinan bi ser civaka Îranê de sepand û jin ku nîvek ji civaka Îranê pêk tîne, ji piraniya mafên xwe ên siyasî, civakî, abûrî û candî, bêpar kirin.

Yasaya bingehîn a Komara Îslamî gelek madeyan li xwe digire ku li gor peymannameya mafê mirov bi awayek eşkere tundûtîjî li dijî jinan tên hesibandin. Bo mînak madeya 114'ê ya yasaya bingehî, rê dide ku jin heya çaxê kuştinê bê kevirbaran kirin, madeya 1130'î ya yasaya medenî, mafê daxwaza telaqê li jinan distîne, esla 115'ê ya yasaya bingehî dibêje ku serkomar dibe li navbera mêrên mezhebî û siyasî de bê hilbijartin, jin nikare mafê qezawetê wergire, du keç bi qasê kurekê dikarin mîratê bavê xwe wergirin,rê nade ku jina Misilman bi mêrê ne Misilman re bizewice, lê berevajî mêrê Misilman dikare bi jina ne misulman re bizewice, çendjinî, zewicîna demî û gelek yasayên din in ku weke yasayên sedsala navîn in, û tu xaleke havpar di navbera wan û yasayên îro ên civaka cîhanî de nine.

Di heyamê 34 sal temenê xwe de Komara Îslamî gelek zilm û zor û tundûtîjî li dijî civaka Îranê bi giştî û jinan bi xasmanî bikar birine. Tundûtîjiyên ku weke cinayetên Naziyan, di cîhanê de deng vedan. Cînayetên weke girtin, îşkence û destdirêjiyên cinsî ên berî îdamê bi meremên mesebî, desteserkirina jinan bi zarokan ve, îşkenceyên derûnî, dabînkirina alavên xwekujiyê ji wan tepeserî û tundûtîjiyên herî tal û dil êş in.

Lê serbarê ev hemû tundûtîjî û tepeserkirina jinan di Îranê de, eva ku cihê dilxweşî û şanaziyê ye ew e ku, civaka Îranê bi giştî û bi xasman jinên azadîxwaz ên Îranî hest bi vê yekê kirine ku jinavçûna tundûtîjiya li dijî jinan di Îranê de, bi tenê li riya nemana Komara Îslamî ve misoger dibe. Lewma em dibînin ku jin hertim di refa herî pêş ya berxwedana li dijî deshilata sofî û melayan de ne û di pêxema gihîştin bi armancên xwe ên siyasî û civakî, û herweha nehêlana tunduûtîjî ya li dijî jinan jî, gelek jinên weke Zehra Kazimî, Zehra Benî Yeqûb, Nida Aqa Sultan, Perwane Firûher, Teranê Musewî canê xwe gorî kirine û gelekên din jî weke Halê Sûbhanî û Nesrîn stûde di girtîgehên Komara Îslamî de, li benda cezayên giran in.

## Rewşa zarokan di Îranê de wê xiraptir be



**Heftînameya Birîtanî ya Êkonomîst eşkere kir ku, di nava 80 welatên cîhanê de, Îran li dor rewşa jiyana zarokan li sala 2013'an, di pileya 58'an de cih digire.**

Di vê xişteyê de ku li jêr navê cîhan di sala 2013'an de hatiye belavkirin, dîmenekê li jiyana wan zarokan li sala pêşiya me wate 2013'an de radixe ber çavan.

Li gor belge û dekomêntên vê lêkolînê, derdikeve ku welatê Siwîsê baştrîn welat bo jiayan zarokan di sala 2013'an de ye.

Di xişteyê de piştî welatê Siwîsê, welatên Usturalya, Siwîd, Danmark û welatê Sengapûrê cih digirin.

Piştî Îranê ku di pileya 58'an de ye, welatên Tûnês, Misr, Bûlxaristan, Elsalwador, Fîlîpîn û Sirîlankayê cih digirin. Sê welatên dawiya xiştê jî, welatên Ukrayn, Kînya û Nîcêriye ne.

## Nameya Napilyon bi 187 hezar Euro hat firotin



**Nameya 200 sal berî niha ya Împratorê Fransî Naplyon Binapart, ku têde nivîsiye "ez ê Kremlînê bifirînime hewa" bi 187 hezar û 500 Euro hate firotin.**

Li paytextê Fransa li Parîsê, ji aliyê muzexaneyek şareza li ser name û destnivîsan, nameyeke Împratorê Fransî Naplyon Bonapart, bi buhayekî deh qatî hate firotin. Dihat texmîn kirin ku ew nameya han, di navbera 10 û 15 hezar Euroyî de bê firotin .

Împrator Naplyon Bonapart, di nameya xwe de wiha nivîsiye: "Ez ê Krîmlînê di 22'yê mehê, seet 03 an de bifirînime hewa.

Ew name di 20ê Cotmeha 1812'an de, bi îmzeya "Nap" û bişîfre hatiye nivîsandin. Name wê çaxî, ji Wezîrê Karên Derve yê wî çaxî ku li Parîsê bûye Hugues-Bernard Maret re hatiye şandin. Naplyon di nameya xwe de, tengezariyên sefera Rusyê jî tîne ziman..

## Li Bengladêşe bûyerek dilêş rû

**Karxaneyek nesaciyê li derdora Dakayê, agir girt, û çendîn kedkar di nav agir de şevitîn.**

Nawenda agirkûjeriya Bengladêşê regehand ku, ew bûyera han di şeva şemiyê de rû da û bi sedema vê yekê , bi sedan kes ji kedkarên karxaneyê di qatên serî ên avahiya karxanê ketin.



**Ebdulkerîm Celalî:**

# Daxwazê ji kirêgirtiyên rejîmê dikim ku cardin vegerin nava gelê xwe de, û desta ji vî karê qirêj bikişînin.



**Marif Remezanî kurê Îbrahîm, sala 1341'an, li Gundê Evîheng a ser bi dewera Jaweroya Merîwanê, di malbatek mamnawendî de hatiye dinê.**

Marif her di despêka zarokatiya xwe de seba nebûna qutabxanê, ji xwendinê bê pardibe û tevlî malbata xwe dest diavêje karê cotyarî û şiwaniya pezê xwe.

Marifê xebatkar derheq nasîn û têkiliya xwe bi dinyaya siyaset û Kurdatiyê re weha bi Agiriyê re axivî; Sala 1357'an, dema ku Îran ber bi alozî û serhildana şoreşê ve diçû û hêdî hêdî xelkê dest bi xwe nîşandanan dikir, min û hindek ji xelkê gundê xwe biryar da ku em pasgaya Jandarmêriyê li gundê xwe de bigirin. Me ew binke girt û heyamê çend mehan çend kes ji xelkê gundê me ku yek ji wan ez bûm, weke şora, me nobedarî û birêvebirina karûbarê civakî yê gundê xwe bi destve girt. Em ser bi tu partî û aliyekê nebûn. Piştî çend mehan Çirîkên Fedayî hatine gundê me. Xelkê gundê me bigiştî xwe xistin bereya Çirîkên Fedayî. Di sala 1358'an de, ez bi awayek fermî bûm pêşmergê Çirîkan. Sala1358'an, dema ku şoreş bi serket, Çirîkan got ku Komara Îslamî rejîmek dije Empiryalîste û em nabe li dijî vê rejîmê şer bikin.

Lewma cudabûn û veqetiyan di nav wan de çê bû û bi awayek nefermî aşbetala xwe ragehandin. Wî çaxî me Komele bi tu awayekê qebûl nebû, lewma min û 14 hevalên xwe, mebiryar da ku em tevlî refên PDKÎ bin û me bo cara yêkem xwe bi Lika Şehîdên Jawero ya ser bi Hêza Zirêbar li Gundê Ewîhengê danasand in. Likê jî em şandin Komîte Şaristana Sinê li Gundê Tewrîwerê, ewan jî seba şarezayiya min di karê teşkîlatî, ez cardin şandim Komîte Şaristana Merîwanê û bi awayek fermî bûm pêşmergê PDKÎ.

Ew xebatkarê mêhvanê Agiriyê li dor jiyana xwe ya hevpar dibêje ku; Sala 1371'an, li Qislanê di gel Saniye Qadir Zade min jiyana hevbeş pêk anî û berhema jiyana me jî keç û kurek e.

weş ya jiyana xwe tîne ziman û dibêje; Kongireya 8'ê, dema ku em ji dorpêça Helebçê derbas bûn û ber bi Qendîlê ve çûn. Wî çaxî Rêberatiya Şoreşgêr ji partiyê veqetiya bûn û hindek ji wan di nava refên kadr û pêşmerge de xwe weşarti bûn û karşikênî dikirin. Pêşmerge ji karê wan pir aciz bûn. Di salona Yekîtiya Lawan de civînek bi peşmergan re pêkanîn li dor, şêwaza riftar digel cemaeta veqetiyayî. Civîn ji aliyê Dr . Sadiq Şerefkendî ve hat birêvebirin.

Wêdemê min bo cara yekem ji nêzîk ve rêberê xwe dît. Pirxweş bû û min karî ku li xizmeta rêberê xwe de hindek gotinan bêjim.

Lê li dor roja herî nexweş a jiyana xwe, weke piraniya pêşmergên din ên PDKÎ dibêje ku; Roja cejna Qurbanê,em li Gundê Mazîbin a ser bi Bajarê Merîwanê Bûn.

Ehmed Padiganî û gelek ji endamên teşkîlata navxwe jî mêhwanên me bûn. Min hertim radyoya xwe hebû. Wê rojê bernameyên RDKÎ weke rojên din birêve nediçûn û gelek sirûdên şoreşgêrî belav dikirin. Min bi heval û mêhwanan re got ku ez pir nîgeranim û hêvîdarim ku tu tiştek neqewimî be. Piştî çend xulekan Ehmed Şêrbegî nûçeya şehîdkirina Kak Dr. Qasimlo belav kir. Roja cejna me bû roja şîn û giryanê. Eve roja herî nexweş a jiyana min e ku tu caran nahê ji bîrkirin.

Marif Remezanî dibêje; Piştî pitir ji 30 salan min tu çavnihêrî ji PDKÎ nine û bi tenê hêviyek min heye, ew jî ew e ku ez partiya xwe bi serkevtî di Kurdistanê de bibînim, da xwîna şehîdên me bi xisar neçe.

Di daviyê de Marifê pêşmerge rû li xelkê Kurdistanê di ke û dibêje; Xelkîno! xortino! Refên PDKÎ pir bikin, helmetek nû bixin kar. Dunya, bixasmanî herêma rojhelata navîn di guhertinê deye, hewil bidin da bahoza guhertinê Kurdistanê jî bigire, lewma refên partiyê çi weke pêşmerge, çi weke endamê teşkîlata navxwe pir bikin.

**min tu çavnihêrî ji PDKÎ nine û bi tenê hêviyek min heye, ew jî ew e ku ez partiya xwe bi serkevtî di Kurdistanê de bibînim.**



**Ebdulkerîm Celalî kurê Mihemed Salih, sala 1329'an, li Bajarê Nosûdê, di malbatek mamnawendî de hatiye dinê. Her li bajarê Nosûdê diçe mektebê û qonaxa despêkî û nawendî bi daw îtîne. Piştî wergirtina medreka sîklê dest ji xwendinê dikêşe û dest diavêje karûbarên malbata xwe.**

Ebdulkerîmê pêşmerge di sala 1349'an de, diçe leşkeriyê û di Payîza sala 1351'an de leşkeriyê bi dawî tîne û cardin vedigere mala xwe. Navbirî piştî midehekê weke karmend li Muxabirata bajarê Nosûdê tê damezirandin û hewdem bi şêweya mûteferiqe cardin dest bi xwendinê dike. Piştî sêsalan seba wergirtina medreka dîplomê ber bi Bajarê Kirmaşanê ve diçe û li wir medreka dîploma xwe werdigre.

Ebdulkerîm derheq nasîna PDKÎ weha bi Agiriyê re diaxive; "Berî serhildana şoreşa gelên Îranê, birayê min yêmezin bi nave Sebrî çû û tevlî refên pêşmergên PDK Îraqê bû".

Piştî midehekê bala Mekteba Siyasî ji PDK Îraqê veqetiya û Sebriyê birayê min jî digel wan ket. Piştî midehekê li derdoraTewêlê cardin Sebrî li nav Yekitiya Nîştimanî rewiya û vegeriya nav PDK Îraqê de. Ev pêşmergatiya Sebriyê birayê min, bi min re bû hêcetek ku ez berdewam seredana birayê xwe bikim û ji nêzîk ve partiyên siyasî ên Kurd nasbikim û digel şoreş û tevgera nîştimanî ya Kurdan nasyar bibim û têkilî mesela netewî bibim.

Ebdulkerîmê pêşmerge dibêje ku; sala 1357'an, dema ku şoreşa gelên Îranê dest pêkir, gelek ji xelkê Bajarê Nosûdê tevlî refên pêşmergên PDKÎ bûn ku min nasdikirin. Dema rejîma paşatiyê herifî û Komara Îslamî hat serkar, min weke endam midehê şeş mehan xizmet bi PDKÎ kir, pişt re komîteya partiyê li bajarê me hat avakirin û şehîd Hekîm Rizayî weke berpirsê komîtê hat diyarîkirin. Lewma di sala 1359'an de, bi awayek fermî xwe bi komîteya PDKÎ li Bajarê Nosûdê nasand û ez bûm pêşmerge.

Navbirî li dor jiyana xwe ya hevpar weha bi Agiriyê re dipeyve; sala 1347'an, dema ku temenê min 18 sal bû, min digel Qedrî Reûfî jiyana hevbeş avakir û niha jî berhema jiyana me du kur û sê keçin.

Navbirî bîreweriya herîxweş a jiyana xwe weha tine ziman; sala 1367'an, Hêza Şaho, Melbenda du, û beşek ji Melbenda yek a Kurdistanê, di dema ku axa Îranê bi cih dihêlan û ber bi başûr ve dihatin, li derdora Helebçê, ketin navbera şerêher du dewletên Îran û Îraqê de. Em nêzîk bi 700 kes bûn bi jin û zarokan ve. Du şev û rojan em di bin agirê şer de man. Tu kes bi hêviya rizgarbûn ji vê rewşê nebû. Lê piştî darêtina bernameyek rêkûpêk ji aliyê fermande û serkirdatiya partiyê, ev hêza 700 kesî bi silamet û bê zirarên canî derbas bû. Eva roja herî xwe a jiyana min e.

Lê roja herî nexweş a jiyana min ev e ku sala 1368'an, ez tevlî şehîd Mensûr Fetahî ku berpirsê melbendê û Mela Ehmed berpirsê Komîte Şaristanê bû, li devera Merîwanê bûn. Kak Mensûr Fetahî em gazî kirin û bi mere got ku, Dr. Qasimlo hatiye şehîdkirin û piştre RDKÎ jî nûçeya vê belav kir, eva roja herî nexweş a jiyana min e

Ebdulkerîmê xebatkar dibêje ku; Tu çavnihêriyên min ji PDKÎ nine. Şeş kes ji malbata min şehîdên PDKÎ ne. Ez bi xwe jî pitir ji 30 salan e ku di nava partiyê de xebatê dikim. Bi tenê ez dixwazim ku partiya min yêkrêziya xwe biparêze. Ez bi veqetiyana hevalên berê ji partiyê pir aciz bûm. Ez hevî dikim ku ev diyalog û civînên her du aliyan bigehin encamek baş. Di daviyê de daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikim ku yekrêziya xwe biparêzin û jialiyê rejîmê ve nehên xapandin. Herweha daxwazê ji wan kesan dikim ku di xizmeta Komara Îslamî de ne cardin vegerin nava gelê xwe de û desta ji vê karê qirêj bikişîn in.

# Şaristana Bane



Mecîd Cinîkanlû

Şaristana Bane yek ji Şaristanên bi nav û deng yên Parêzgeha Sinê ye. Ev bajar li rojavayê Îranê û li cem çiyayê Arbaba hilketiye. Hejmara nifûsa vê Şaristanê pêka serjimêriya sala 1388'an 120.888, kese û tewahiya herêmê de, Kurd bi zaravê Soranî dipeyvin.Kurdên herêmê hemû bawermendê ola Îslamê ne.

Şaristana Banê li Çar herêmên Navendî, Nemeşîr,Armirde û Bûîn pêk tê, û Şaristan xwediyê çar bajarê: Bane, Armirde, Kanî Sûr û Bûîn e.

Ew Şaristan ji aliyê bakûr ve, li gel bajarên Bûkan û Serdeşt ê, û li rojava û başûr li gel başûrê Kurdistanê û li rojhilat li gel Şaristana Seqizê hevsînor e.

Çiyayên herêmê piranî bilind û bi çiyayên wek: Gakir, Sûrkêw, Kûtê Reş hatine dorpêç kirin. Li wan çiyayan darên wek Mazî, berû, Zalzalek, Hirmî, Badam û Gîz û gelek tiştên din peyda dibin.

Li Şaristana Bane çend çem û rûbarên wek: Çûman, Şiwê, çemê Banê, Nimşîr û ...hwd diherikin, ku hin ji wan têne nav başûrê Kurdistanê. Li ava wan çem û rûbaran ji bo çandiniyê mifah tê sitandin û baxên Sêv,Hirmî û Tirî li herêmê de hene. Li herêma Banê gelek asewarên kevin jî hene ku dîroka hin ji wan gelek kevn e. Li gundê Nemeşîr û li qebristana wî gundî de hin nivîs û dîmen li ser kêlên qebran hene ku dîrokekî gelek kevin hene.

Herwisa li pişt çiyayê Arbaba û gundê Kêwerû û gelek cihên din şûnwarên kevin yên Kurdan tên dîtin ku mixabin seba siyasetên gemar yên rejîma Îranê li derheq dîroka neteweya Kurd heya îro rojê çi lêkolîn li ser wan cihan nehatine kirin ku bê şik parek mezin li dîroka gelê me li sîngê





**Li serdemê Sefewîyan de Hakimê Bane Mîrza Beg û Bodaq Xanê kurê wî bûne.Piştî mirina Şah Tehmasbê Sefewî Silêman beg û paştir Bedir Beg bûye hakimê wî bajarî**

xwe da ragirtine.

Derheq dîroka bajar de bîr û ra zaf in. Lê eva ku xûya ye Bane her wek bajarên din yên Rojhilata Kurdistanê dîrokekî gelek kevin heye û zaf caran jî hatiye kavilkirin. Li sala 628'ê de, Herakûps, Împeratorê Romê piştî kavilkirina Şarezûrê li başûrê Kurdistana Îroyîn hate bajarê Banê, û heft rojan li wir ma û piştre derbazî bajarê Hemedanê bû.

Heta berî Îslamê bajarê Banê li dest malbatekî Kûrdên Zerdeştî ê bi navê Qeqû bûye kû piştî êrişa Ereban bûne Mûsilman. Heta pêş Sed sala Sêzdan navê bajarê Banê, Berojê bûye.ev bajar li Şerê yekem û dûyem yê cîhanî bi tewahî hatîye şewitandin. Li ser navê Banê piraniya xelkê li ser wê baweriyê ne ku wateya wî bajarî ew e ku bi wateya bilindahî yan jî serban tê. Jiber ku Bane li cem çiyayê Arbaba ye, dibe ku ew gotin rast be .Li pirtûka bi nav û deng ya Mîr Şerefxanê Bidlîsî de hatiye ku: Bane navê bajarekî ye ku serokên Hozan li wir dethilat bi dest bûn. Ev bajar li du herêm û du Kelan pêk tê, ku yek ji wan Kela Bîroz û ya din Kela Şiwê ye ku dikeva navbera wîlayetên Erdelan, Baban û Mokiryan.

Li serdemê Sefewîyan de Hakimê Bane Mîrza Beg û Bodaq Xanê kurê wî bûne.Piştî mirina Şah Tehmasbê Sefewî Silêman beg û paştir Bedir Beg bûye hakimê wî bajarî.

Li sala 1019'an de Şah Ebbas ê Sefewî ji bo tepeserkirina serhildana Kurdên herêma Mokiryan êrîşî ser Kela Banê dike û li sala 1021'ê de Kela Eskender Begê Banê tê Girtin û nêzîk bi 1000 kesan li Kurdên serhildayî tên kuştin. Piştî têkçûna deshilata Sefewiyan li sala 1145'ê, Nadir Şahê Efşar ji bo derxistina Osmaniyan êrîşî ser bajarê Banê dike û wan li bajêr derdixe.


Li sala 1320'î de û piştî vê ku Îran bi destê hêzên Rûsiyayê tê girtin, serdarekî Kurd ê bi navê Mihemed Reşîd Xanê Bane dest bi xebatekî birûmt ji bo rizgariya Kurdan ji destê Îran û Rûsiyê dike. Navhatî li heyamekî gelek kêm de bajarên Bane û Seqiz û Serdeştê rizgar dike.

Lê mixabin seba êrîşa dewleta Îranê û çend şerên giran, Mihemed Reşîd Xan neçar dibe herêmê bi cih bihêle û ji bo heyamekê li Kurdistana başûr akincî dibe. Li sala 1322'an de Mihemed Reşîd Xan vedigere Banê û bo yekem car radiyoyekê gel xwe bo bajêr tîne û li herêmên derdora bajarê Banê wek herêmekî Otonom ava dike.

Li sala 1323'an de, navhatî êrîşî ser bajarê Merîwanê dike û bajêr digre destê xwe. Lê mixabin li Banê hin eşîrên Kurd dikevine gel dewletê û hêzên Mihemed Reşîd Xan piştî haydarkirina xelkê herêmê û daxwaz ji wan bona valakirina bajar, agir li bajar berdidin û bi vî awayî bajar bi tewahî tê şevitandin.

Li Rêbendana sala 1324'an de Mihemd Reşîd Xan tevlî Komelaya " J-K" li bajarê Mihabadê dibe û li damezirandina Komarê de rolekî berçav dilîze. Her seba xebat û tekoşîna wî ji aliyê Pêşewa Qazî Mihemed ve, wek Jeniral tê binav kirin. Mixabin piştî têkçûna Komarê bi neçarî dest ji Komarê hildigre.

Çiyayê Arbaba wek dayîkekî dilovan bajarê Bane li hembêza xwe ya gerim de cih daye. Bêguman hindî zulm û zorî hebe xebata gelê Kurd jî dê her berdewam be.



# Destberdan ji xwendinê li Kurdistanê gefek mezin e



Efşar Ceferî

Di pêvajoya pêşveçûna jiyan û kultûra neteweyên cîhanê de xwendin rolekî bingehîn û giring dilîze. Xwendewarî û zanebûn faktora serbestî û bextewariya gelan e. Gelên ku niha di cîhanê de xwedî jiyanek bi rûmet û serkevtî û civakek aktîv û pêşketî ne, ev yek berhemê xwendin û giringîdana wan bi navendên zanistî û akademîk e.

Xwendewarî mafek bingehîn ê mirovan e û dibe sedema çêbûna guhertinên mezin di jiyana mirov û gelan de.

Hezkirin ji xwendin û zanebûnê tiştek e ku di nav hundirê hemû mirovan de heye û her kes ji pêşdeçûn û jiyanek bi rûmet hez dike. Weke zarokekê ku li dewrana zaroktiyê hez dike biaxive û hemû tiştên jiyana derdora xwe kifş û nas bike û fêr bibe. Lê dema dikeve nav civakê û dest bi xwendinê dike, asteng û pirsgirêk zarokan ji mafê xwendinê bêpar dikin. Li Kurdistanê ji ber rewşa siyasî ya ku kurd têde dijîn, ev yek pirr berçav e.

Li gor rapora rêxistina UNESCO ya ser bi NY ku bi boneya Roja Cîhanî ya Xwendewariyê ya 2012`an (08.11.2012) weşand, 775 milyon mirov di cîhanê de nexwendewar in ku ji vê rêjeyê 122 milyon ciwan in. Herwiha 2 ji 3`ê nifûsa ne xwendewarên cîhanê jin û keç in. Bi vî awayî 775 milyon mirov ji pêşdebirina şiyanên xwe û mafê mirovan bêpar hatine kirin.
Rojhilatê Kurdistanê beşek ji vê serhejmariyê pêk tîne.

Li Kurdistanê di salê de hezaran zarok û nûciwan dest ji xwendinê berdidin. Sedemên vê yekê jî gellek in. Yekem, Komara Îslamî ya Îranê, Kurdistan kiriye herêmek milîtarîze ku têde ne ewlehî û şer diyardeyek rojane ye. Duyem, zimanê dayikê ango Kurdî qedexe ye û tu zarokek kurd nikare bi zimanê Kurdî bixwîne û binivîse di navendên xwendinê de.

Sêyem, nebûna îmkan û derfetên perwedehiyê yên standard û baş e. Li deverên kurdan herî kêm dibistan û xwendingehên despêkî heta paş navendî hene. Ji bo çendîn gundan li Kurdistanê, tenê dibistan û xwendingehek heye ku kêmasiyên pirr berçav jî hene.


Çarem, meşandina ferq û cudakariyên olî, neteweyî û siyasî ne ku li dijî xwendekarên kurd ji dibistanê heta zanîngehê tên pêkanîn. Ciwanên kurd dema dikevin zanîngehê yan ger di îdare û dezgehek dewletê de bê damezrandin, divê raporeke tayebt a ewlekariyê li ser wî û malbata wî bê komkirin ku gelo ew welatparêz û neteweyî ye an na! heta derfeta kar jê re bidin.

Pêncem nebûna hêviya kar û jiyanek normal ji bo qonaxa piştî xwendinê ye, niha dehan hezar xwendewar li Kurdistanê hene ku zanîngeh jî qedandine, lê bêkar in. Sedema din jî pirsgirêkên aborî yên malbatan in ku dibe sedem zarok dest ji domandina xwendinê berdin û bibin alîkar bo debara dijwar ya jiyanê.

Helbet kesên ku li Kurdistanê di dezgeh û îdareyên dewletî de tên damezrandin, herdem di bin çavdêriyek xurt a ewlekariyê de ne. Bi hêcetên curbicur û bi taybet welatparêzî û rexnegirbûna wan, ji kar tên derxistin û gefa bêparkirin ji kar herdem li ser wan heye.

Xwendin li Kurdistanê viyan û xwesteke mezin a keç û xortên kurd e û selimandine jî ku karîn û şiyanên pirr bêhempa jî di fêrbûn û xwendinê de hene. Lê pirsgirêk û astengên ser rêya xwendinê li Kurdistanê, dilsariyek mezin ji bo xwendekarên kurd pêk aniye ku her diçe rêjeya kesên ku dest ji xwendinê ber didin, zêdetir dibe. Ev yek gefek mezin e li ser civaka Kurdistanê ku berpirsyariya vê yekê rayedarên Komara Îslamî ya Îranê ne.

Xuya ye ku dewleta Îranê ku dijminê kurda ye, naxwaze keç û xortên zane û hişyar ên kurd zêde bibin û li maf û azadiyên xwe xwedî derkevin da ku pirsgirêk û kêmasiyên civaka xwe bixin berbas. Ev rewş li deverên ser sînor ên Kurdistanê gellek berçav e û xwendewarî ji ber sedemên jor kêm e. Pêşeroja Kurdistanek azad û avedan pêdivî bi nifşek zane û xwendewar heye, loma her kes û malbatek divê ji bo domkirina xwendina keç û xortên xwe rolê xwe yê civakî û neteweyî bilîze.



## Kaniya helbestan



N: kamran simo Hedil

### Bilbilên lal

Birçiyên bawerî têr
zanîna zimanê
ku watayê li peyvan dike
têra xwestina dil nake
nikare hesreta min bi lêv bike
çav
li girtina xewna hê nehatiyê
dîtin digerin
dest pî û hiş
hatina rojê silav dikin
dîwarê zengara bêdengiya
zenggirtî
dê bitelişe
awir kûr kûr
biqasî awir negihinê dûr
dinêrin
kulîlkên biharê
di tîrêjên aso de jan û êşê
dikişînin
baskên hêviyê
di bîbikên çavan de diçîrisînin
siya di tariya sar de
gav bi gav dûr dikeve
û
bê gunahiya asîmanê şîn
di çavên min de zîl dide


Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



# Pêşmergên PDKÎ li bere berê 26’ê Sermawezê hêviyên di dilê xwe de bi Agirî re parve kirin



**Dijwariyên xebatê gelek caran ez neçar dikirim ku dev ji pêşmergatiyê berdim, lê hezkirina xelkê ji pêşmerge, ez poşman dikirim.**



Mihemed Dilsoz:

**Dema ku Radyoya Dengê Kurdistana Îranê daxistin, ez ji neriheti û bêdesthilatiyê de gelek giriyam.**




Xalîd Mehmûdî:

**Şehîdkirina wan rêberan bi qasekê bandor xistibû ser hêza pêşmerge ku tu hêvî di dilê wan de nemabûn, lê biryar domandina xebatê bû.**



Mam Quwet:

**Min jî her weke bav û birayê xwe tewahiya temenê xwe di pêxema rizgariya netewa xwe de derbaz kir, û pir keyfxweş im û şanaziyê bi vê rêbazê dikim.**



Mam Ehmed:

**Dr. Qasimlo hertim digot, hewil bidin ku ji riya hişyarkirina xelkê ve, pirsgirêkên eşîretî li herêmên Kurdistanê de kêm û çareser bikin.**



Eli Xefûrî:

**Min tu daxwaz û çavnihêrî ji partiya xwe nînin û hekî pêdivî be, ezê taqane kurê xwe jî gorî vê rêbazê bikim.**